Em Savayne

Remezan Îsma`îl Gereguhî

Savayne savayne
Ronahîya çavayne
Fêqyê nîva mala
Xudê em ho dayine
* *
Me despêke li jînê
Bo xoşî û evînê
Em dê xo berihev keyin
Da em jî bigehînê
* *
Divêt zanînê xirr keyin
Mêşkê xo jê pirr keyin
Ne bi şev û ne bi roja
Nabît xo lê kirr keyin
* *
Bibîn kesên zana
Serukên xêzana
Wekî Cigerxwînî
Vehînîn hozana
* *
Umêda bo xo danîn
Rêkên baş bizanîn
Bo evî welatî
Sube em xudanîn
* *
Wekî xudan doza
Digel tev dilsoza
Ahenga bigêrrînîn
.Li bihara û newroza